

## Rapora konsolusê Erziromê Pavlovskî

08.04.1923. N. 289

**Gelê kurd heta nuha hevî dike, dê armanca pîroz ya azadkirin  
û yekîtiya tevaya Kurdistanê pêk were**

Dokumentê li jêr rapora konsolusê Yekîtiya Sowyetê yê li Erziromê Pavlovskî ye. Konsolus Pavlovskî bi şeweyek gelemperî kurteanalîzeka destpêka salên 1923ê ya rewşa tevgera netewî ya kurdî dike.

Pavlovskî di raporê de, li ser nerîn û helwesta dewleta Tirk ya di derheq neteweyê kurd, tevgera netewî û rêveberiya wê de radiweste. Behsa têkiliyên rêvebirên tevgera kurdî yên bakur, rojhilat û başûrê Kurdistanê dike û bi taybetî li ser têkiliyên xwe û Xalid Begê Cibrî radiweste. Helwest û raya Xalid Begê ya di derheq têkiliyên rêveberên kurd yên bi ingilîz û rûsanê re dinirxîne û şîrove dike.

Dema mirov vê raporê dixwîne û agahiyên tê de bi rewşa tevgera netewî ya kurd ya serdema em têdene dide ber hev, dibîne ku pêwîst e dîrok ne tenê ji xelîyên borî sûdê bigire. Ji bo rewşa em têde ne bê fêmkirin û karibin sedemên xeletî û kêmasiyên xwe bibînin, dîroka tevgera netewî ya miletê kyurd ne tenê bi kemasî û xeletiyên, herweha bi gelek çalakî, bûyer û helwestên erênî jî dewlemend e. Divê me şîûrek û zanebûnek dîroka netewî û welatê xwe hebe da em karibin hêlên wê yên erênî û neyînî binirxînin, şîrove bikin û jê sûdê bigrin.

Ji agahiyên di vê raporê de em fêm dikin ku şîûra netewî, tevgera netewî ya di destpêka salên 1920ê de ji ya dema me gelekî pêşdetir bû. Yekgirtî, lihevkerî û birêxistin bû. Li beşên Kurdistanê rêxistinên cuda yên netewî hebûn, lê hêvî, helwest û armancên wan yek bûn. Azadiya netewa kurd, rizgarî û yekîtiya Kurdistanek serbixwe armanca hemûyan bû. Şîarên wan ne tenê bi gotin bûn. Ji xwe bawer bûn, ji hev bawer bûn, rêza xwe dizanîbûn û rêza hev digirtin. Ji bo wê jî, ji bo doza pîroz ya serxwebûna Kurdistanê pêk ve tevdigeriyan û li dijî dagirkeran xwedî heman helwestê bûn.

Hevî dikim mirovên vê raporê bixwînin karibin nirxandin, şîrove, têbînî û rexneyên xwe binivîsînin da ji bo me hemûyan bibe derfetek danûstendina fikir, şîrove û rexneyan.

## Rapora konsolusê Erziromê Pavlovskî

08.04.1923. N. 289

**Dokument 3:**

08.04.1923. N. 289.

Hukûmeta Tirkîyê, heta nuha naxwaze rastiya sedemên tevlîhevî û gûmanên girseyên gelê kurd yên di van du salên taliyê de nîşan dide, fêm bike. Hukûmeta Tirkîyê van bertekên gelê kurd nîşan didin wek çalakiyên berê yên bê armanç dinexîne û dihesibîne. Hesab dike ku rêvebirên kurd yên bêsoz, bêistîqrar, hêsa tînan xapandin û ji hemû fenûfût û macereyan re musaîd in li pê van çalakiyan in.

Girseya kurd ya veşartî, îdin piştrast bûye. Bi rasti îdin dereng e; diva bû sekna me ya di derheq serhildana Simko de cidîtir ba, lê me ew bi terzê kevin şirove kir. Micadela li dijî wê bi metodên kevin bê fêde ye, ji ber ku ev tevger ne wek yên berê ye. Yên berê, piranî berjewendiyên şexsî yên serokekî kurd diparastin. Ew (serhildana Simko F.N.) bi frehî ji teref serokekî kurd yê herî jê dihate hezkirin, ji bo azadî û serxwebûna Kurdistanê hat îlankirin. Hemû rêberên kurd û tevaya gelê kurd bi erênî pêşwazî li vê serhildanê kirin, xwe nezîkî vê tevgerê (tevgera Simko F.N.) kirin û bawer kirin û dixwastin ku fikrên Kurdistanek serbixwe di jiyana de ji cîh bigre. Bi taybetî piştî azad bûna gelên Rûsyayê ev hizir zêdetir xurt bû.

Hikûmeta Tirkîyê sala buhurî bi xayintî (bi awayekî din nikarîbû) li leşkerên Simko xist û ew şikandin. Difikirî ku bi vî awayî dikare gelê kurd bê deng bike. Hukûmeta Tirkîyê fêm nedikir û ne dixwast fêm bike ku salên taliyê hemû (hemû kurd F.N.) tê gihîştin û bi taybetî rêberên kurd yên wek Xalid Begê Cibrî, hevalê Simko yê şer Teymûr axa û yên dinê fêmkirin çî pêwîst e bikin. Wan ez agahdar kirim ku dizanin: Heger gelekê ji bo tekoşîna azadiyê serî hilda be û ji bo ew tekoşîn bê rawestandî û aşîtî bê sazîkirin, pêwîst e mirov mafê wî yê ew dixwaze bidîyê, yan jî ew dê bixwe mafê xwe bistîne.

Birastî gelê kurd (li başûrê Kurdistanê F.N.) mafê xwe yê ku hukûmeta Tirkîyê red dikir, bi xebata xwe bidest xistî ye. Rast e, zahmet e mirov karibe muhakeme bike: Gelo heta kîjan derecê dê azadiya Kurdistanê bê tetbîq kirin û dê serxwebûna Kurdistanê bi kude biherikê. Ji ber ku kurdan alikariya ingilîzan qebûl kirine, ketine bin bandora wan ber barbaran (ingilîzan F.N.) û pêkan e dê dereng têbighên ku wan ji ber baranê bazdane bin mezzîbê.

Lê gelê kurd heta nuha hevî dike, dê armanca pîroz ya azadkirin û yekîtiya tevaya Kurdistanê pêk were. Ew hêj giraniya panîyên ingilîzan his nake û gazinan nake, berovajiyê wê, ew piştgiriyeke gelek mezin dide hikûmeta (hukûmeta başûrê Kurdistanê F.N.) xwe û ji bo wê di nav kurdên Tirkîyê yên hîn tevlî wan nebûne de jî ajitasyonê dike.

## Rapora konsolusê Erziromê Pavlovskî

08.04.1923. N. 289

*Em amade ne li dijî ingilîzan şerî bikin, lê diyar e axaftin li ser şerê li dijî birayên me yên kurdên azad de tê kirin û ji ber wê jî em dê bê teref bimînin.*

Werhasil, di destpêka meha adarê de agahdar bûm ku tirk bi behaneyê şerê bi ingilîzan re, dixwazin li dijî kurdên başûr 12 alayên (alayên eşîretan F.N.) herêma Diyarbêkrê di herketê xîn. Tirkan ji van alayan re ragîhandin ku ew wan ne ji bo şerê li dijî ingilîzan, lê ji bo têkbirina Kurdistanê serbixwe (Ya li başûrê Kurdistanê bi serokatiya Şêx Mahmûd Berzencî F.N.) sefera xwe hazir dikin. Lê di neticê de van alayan banga hikûmetê red kirin û ji tirkan re ragîhandin: Ew amade ne li dijî ingilîzan şerî bikin, lê diyar e axaftin li ser şerê li dijî birayên me yên kurdên azad de tê kirin û ji ber wê jî em dê bê teref bimînin.

Helbet tirk tê dighên ku bêteref mayina van alayan tê wateya ku ew jî terefê hukûmeta kurdî ne. Heger tirk wan bi zorê di hereketê xîn, di firseta yekem de ew dê derbazî aliyê din (hukûmeta kurdên başûr F.N.) bibin. Her weha li Kurdistanê hêza hukûmeta Tirkîyê ya karibe bi zorê wan bêxe hereketê tune. Serokê van alayan (Eşîra Cibrî) Albay Xalid Beg gelek vekirî bi min da fêhm kirin: Hikûmeta Tirkîye dikare hesab bike ku heta careka din gazî van alayan bike ew (alayên kurd FN) dê bêteref bimînin.

Redkirina banga hukûmeta Tirkîyê ji teref alayên bi ser albay Xalid Begê ve, rê li taqîbkirina Xalid Begê û hemû ofîserên kurd yên li Erziromê vekir. Hukûmeta tirk ji wan (Eşîra Cibrî) şiphe dike ku ew ji bona bi hukûmeta kurdî re yek bin, haziriya serhildanekê dikin û herweha hukûmeta tirk wan wek tawanbarên esasî yên banga wê red kirine dihesibîne.

Delîlek din ya bû sedemê taqîbkirina Xalid Begê, îxbara qaymaqamê Mûşê bû. Qaymaqamê Muşê îxbarî di derheq komîta kurdî (Komîta Erziromê F.N.) li Enqerê kiri bû. Qeymeqam tenê di derheq hebûna komîte de xwedî agahî bû, lê di derheqê çalakiyên wê de tiştek konkret nizanî bû. Wî tiştê zanî bû ji serokatiya xwe re got û hewl da biryara taqîbkirina Xalid Begê û terefdarên wî derxe. Herwiha jimara endamên komîte gelek zêde got: 80 mirov.

Asta bihêzbûna sempatiya kurdên Tirkîyê ya ji bo piştgiriya hukûmeta Silêmaniyê ji gotinên Xalid Begê diyar dibe. Wî (Xalid beg) ji min re got: Her çiqas eşîret ji wî hez dike û ji wî bawer dike jî, eşîr naxaze Xalid Beg helweseteke hişk li himber dewleta Tirk bigire. Bi rexmê Xalid Beg tenê bimîne jî lê ew dê piştta hikûmeta başûrê Kurdistanê bigire.

Rapora konsolusê Erziromê Pavlovskî  
08.04.1923. N. 289

Xalid Beg temîn dike ku piraya rêberên kurd yên demê wî û her wiha serokê hukûmetê Şêx Mahmûd, Simko û Şemşeddînî û yên din, ne mirovên xwe firotine ingilîzan in. Ew tekoşerên durust yên azadiya Kurdistanê ne, ji ber pêwistiya alîkariya ingilîzan qebûl kirine.

Di demê taliyê de, ew gelek caran behsa alîkariya ingilîzan dike. Berê wî her tim digot ku ew li dijî stendina alîkariya ji ingilîzan e û ew (her tim li ser navê komîtê daxive) di vê xalê de ji serokên di yên kurdan cûda difikire. Lê anha ew di axaftinên xwe de hewil dide bi min bide bawerkirin ku ji bo serokên kurdan ti rêyên din tunebûn.

*Pêwendiyên min (Xalid Beg) yên fireh bi kurdên navdar re hene û ji her alî de ji min re radigihînin ku ne tenê tirk û faris, lê her wiha rûsan jî beşdarî di şerê têkberina tevgera Simko de kirine. Belkî jî Rûsya gunehkara herî mezin e ku Simko li dijî farisan biserneket.*

Ez dikarim sedemên guhertina helwesta Xalid Begê bi nama wî ya ji serokên Silêmaniyê stendiye û her wiha li ser esasê vê nameyê peymanê di nav wan de çêbûyî, îzah bikim. Ji bo wê jî min meraq kir ji Xalid begê bipirsim, gelo birastî, li ber serokên kurdan ji dervêyî sitendina alîkariyê ingilîzan tu rêyên din tunebûn?

Wî gotin bi gotin bersiva pirsên min da: Pêwendiyên wan yên baş bi hikûmeta kurdî re hene û her wiha agahdariyên di derheqê hikûmeta kurdî de diyar dike ku ew di bin tesîra wan de maye. *"Pêwendiyên min (Xalid Beg) yên fireh bi kurdên navdar re hene û ji her alî de ji min re radigihînin ku ne tenê tirk û faris, lê her wiha rûsan jî beşdarî di şerê têkberina tevgera Simko de kirine. Belkî jî Rûsya gunehkara herî mezin e ku Simko li dijî farisan biserneket. Heger rast be, wê gavê hevreyên min rast dibêjin: Ji dervê alîkariya ingilîzan tu reyên din nebûn. Hevalên min dibêjin: Heger Rûsya di wextê xwe de destê alîkariyê daba me, wan dê hîç axaftin bi ingilîzan re ne kiriba".*

Li vir ez bi awakî herî medenî li dijî fikra ku Rûsya beşdarî di têkberina tevgera Simko de kiribe derketim. Min tenê ihtîmal da ku hemwelatîyên Rûsyayê (rûsiyên spî) yên di wextê xwe de çûbûn Îranê û anha li dijî şoreşa Rûsyayê ne, beşdarî di vî karî de kiribin.

Xalid Beg dubare kir: Bi rexmê hemû van bûyeran gelê kurd ji Rûsyayê hez dike. Her weha, Komîta kurdî bi alîkariya Rûsyayê, şertên min berê pêşkêşî we kiribûn, bi hêsantirî dikare di jîyanê xe. Lê çiv û giraniya Rûsyayê wan (kurdan F.N.) mecbûr dike ku vê hevîyê winda bikin.

Rapora konsolusê Erziromê Pavlovskî  
08.04.1923. N. 289

Xalid Beg ji serokên Kurdistana Bakur-Tirkiyê ev navên li jêr nivîsîne, ji min re jimartin. Ew dibêje: Ev serok bêşik terefdarê Rûsyayê ne û pêwendiyên wan bi wî re hene.

- 1- Hemîd Beg Kanton Orgof-Ixdir (li nik Araratê)
- 2- Lawê Hemîd Beg - Fetteh Beg ew jî li wir (Kanton Orgof-Ixdir F.N.) dijî û ofîserê xizmeta rûsa ye.
- 3- Lawê Hemîd Beg – Kerîm Beg ew jî wek birê xwe ofîserê xizmeta rûsa ye.
- 4- Generalê xizmeta Rûsyayê (muhtemel e hers ê navên li jor hatine jimartin di artêşa Rûsyayê de kar kiribin. F.N.) Elî Eşref, li Beaskentê nezî Arasê dijî,
- 5- Mayor (binbaşi) Resûl beg, li Karakilîsê dijî. Di şerê nava rûsan û tirkan de teslîmî rûsan bû û li dijî tirkan şer kir.
- 6- Hesên beg,
- 7- Şebab beg, ew jî wek Hesên Beg li Orgof-Ixdirê dijî
- 8- Serokê eşîra Celaliyan – Elî Mîrza.

Ji dervêyî Elî Mîrza, hemû serokên kurd yê navên wan li jorê hatine nivîsandin ji malbata Şemşedîniya nin û gelek baş bi zimanê rûsî dizanin.

*Hukûmeta kurdî gelekî xemgîn e û goman dike ku tirk û ingilîzan li hev kiribin. Peymanek weha ji bona Kurdistana serbixwe tehditek e û hukûmeta kurdî berî ku tiştek biqewime dixwaze xwe bi vê (bi dostayî û alîkariya Rûsyayê F.N.) biparêze.*

Bi min xerîb hat, di axaftina me ya vê taliyê de Xalid Beg gelek caran wek li ser navê hikûmeta kurdî dipeyîvî. Wer diyar e divê em şik bikin ku Xalid Begê bi hukûmeta kurdî (hukûmeta başûrê Kurdistanê F.N.) re li hev kiriye û di bin tesîra wan de maye. Rola dostayê di nav Rûsyayê û hikûmeta kurdî de saz bike daye ser milê xw. Gava alîkariya Rûsyayê pewist be ew dê navçetiyê bike. Agahiya ku dişibe rastiyê û min bi dest xistiye ev e: Hukûmeta kurdî gelekî xemgîn e û goman dike ku belkî tirk û ingilîzan li hev kiribin. Peymanek weha ji bona Kurdistana serbixwe tehditek e û ji bo wê hukûmeta kurdî berî ku tiştek biqewime dixwaze xwe bi vê (bi dostayî û alîkariya Rûsyayê F.N.) biparêze.

Wergera ji rûsî: Fewzi Namli

2020-04